# Vexwendin ji bo naskirina me:

Ji kerema xwe hinek dem bidin û vê bixwînin:

Heke hûn dixwazin bêtir zanibin, seredana malpera me bikin!

Baştirîn rê ev e ku hûn pirsên xwe bi rêya forma têkiliyê li me bipirsin.
Ger hûn bixwazin bi şandina fîdbek a nivîskî bi me re alîkar bin, em ê kêfxweş bibin.

Jemal Nebez Stiftung

Dezgay Cemal Nebez

Ger hûn dixwazin bi rêya bûyeran me nas bikin, di salê de du bûyerên me hene:


- Roja Vekirinê di destpêka havînê de
- civîneke salane ya serhêl di heyva December de

Ji kerema xwe vê yekê bizanin ku ji bo beşdarbûn di bûyerên me de pêwîst e hûn despêkê navê xwe tomar bikin. Baştir e ku bi rêya forma ser malperê be:

**https://www.jemal-nebez-stiftung.org**

## Bingehek ji bo berjewendiyên Kurd û Kurdistanê

Cemal Nebez di sala 1960/61an de hatiye Ewropayê. Dema ji welatê xwe wate ji Başûrê Kurdistanê derket, jixwe mirovekî xwedî ezmûn bû. Ew bi çend zimanan diaxivî, berê wek nivîskarekî hatibû nasîn û çend salan wek mamosteyê fîzîk û matematîkê kar kiribû. Li Ewrûpayê despêkê wek karkerekî nepispor xebitî û xwendina xwe domand. Li Hamburgê doktora girt û li Berlînê jî di warê zanistên siyasî de xwend. Ji bo belavkirina zanyariyên xwe yên li ser çanda kurdan û rewşa Kurdistanê li vê beşa cîhanê gelek ked da. Ew li Ewropayê gelek welatiyan re pêşkeş geriyaye, bi hevciviyaye û gotar kirine. Ji nêz ve girêdayî herçar parçand û bûyerên çeyên Kurdistanê ma, bêyî ku di nava 60 salan de carek vegere Kurdistanê.



Hişmendiya wî ya zimanî, karîzma wî ya kesayetî û zanîna wî ya zêde li ser ziman, çand û dîroka Kurd û Kurdistanê, rê ji hevwelatiyên wî re vekir ku bibêjin: *„Cemal Nebez li ku be, Kurdistan jî li vê derê ye“.* Wî gelek berhemên nû di warên pir cuda de nivîsandine.

Ev dezgeh ku bi navê vî bîrmend û pêşengê mezin ê Kurdolojiyê hatiye avakirin, bi şêwazek hatiye damezrandin ku hebûn û vemana xwe misoger dike. Di vî warî de tu astengiyên wê tune ne. Lêbelê, hewcedarê alîkariya darayî ye, da ku karên xwe yên yasayî bi rûmeta navê xwe bi rengekî ku wî pesnê xwe daye bimeşîne. wate:

Ji azdiyê bo azadiyê

■

Di prensîbê de ji bo parastin û pêşveçûna zêdetir a mîrata çandî ya Kurd û Kurdistanê.

■

Li dijî 120 sal jibîrkirina tawankarane û îhmalkirina berjewendiyên rewa yên Kurd ji aliyê rêxistinên navneteweyî yên ku ji vê yekê berpirsyar in, weke komeleya gelan û rêxistinên ser bi UN

■

## Em li ku ne? Û em çi dikin? Em çi dixwazin.

Em li Berlîn-Wilmersdorfê ne. Cemal Nebez hê jî di nav wê malê de tê naskirin û wî ew cîh bi kar aniye. Niha jî aîdê dezgehê ye. Dezgeha Cemal Nebez hîn nû ye û ji 31.03.2020 ve heye. Di 16.06.2020 de biryar hat dayîn ku yasayên 20.03.2020 bihêne hemwarkirin dakû şert û mercên qezenc-nexwazî pêk bihên.
Hûn dikarin li ser rûpela me belgeyan bibînin.

Wate û armanca dezgeha Cemal Nebez piştgiriya zanist, lêkolîn û perwerdeya giştî û herwisa warê pîşeyî, hunerî û çandî ya kurdan e li Kurdistanê û li welatên din ên cîhanê jî, çi li gorî rewşa wan a niha û çi ji aliyê dîrokî ve.




- Em berhemên Cemal Nebez û pêzanînên li ser jiyana wî diparêzin û belav dikin.
- Armanca me ev e ku her sal xelata Cemal Nebez bihête dayin.
- Em piştgirî didin kesên/komel û lêkolîn/projeyên wan ên jêhatî bi dayîna bûrs û perwerdehiyê - ger em karibin sponsorên guncav jê re bibînin.

# Projeya demdirêj - Pirtûkxane/Arşîv, projeyên pirtûkan

Li cîhê me li Berlîn-Wilmersdorf jûrekî me heye ku em dixwazin piştî amadekariyê di hin deman de bixin bin destê bikarhênerên qeydkirî yên pirtûkxaneya xwe. Di vê jûrê de berhemên Cemal Nebez wek kolek-siyona taybet di pirtûkxanê de hatine bicihkirin. Hemî pirtûkên din li refikên din in.





Li milê rast û çepê pirtûkxanê de cîhê hil-girtina kovaran heye ku cîhe pêşangeh jî lê heye, bo mînak ji bi pîşandana ev pirtûkên ku nû derketine.

Herwisa ev jûr ji bo semîner û dersên serhêl jî guncaw e, bo mînak bi boneya roja me ya vekirinê.

Arşîva dezgeha Cemal Nebez a ku ji rojnivîskên şexsî, nivîsên neçapkirî, nameyên destnivîs û hwd pêk tê, dê piştî bi demekê li navenda dezgehê berdest bin ji bo lêkolînê.



Ji kerema xwe seredana rêpela me û bi taybetî jêrrûpelên „Pirtûkxane“, „Projeya Demdirêj“, û “ Projeyên Pirtûkan“ bikin. Em spasdar in ji bo her bexşîn û piştgirîyêkê.

Ger pêşniyarên we hebin, ji kerema xwe me agahdar bikin. Pir baştir e bi rêya forma têkiliyê ya rûpela me be: **https://jemal-nebez-stiftung.org**

# Arastekirina Navneteweyî

Em vê belavokê bi zimanê Kurdî bi dû şêwazên nivîsandinê: Kurdî + کوردی û bi Îngilîzî û Almanî belav dikin. Kurd dema ku lehçeyî biaxivin, dikarin tiştekî bipirsin an şîrove bikin û ji hev fam bikin. Lê dema ku tiştek bi nivîskî dixwînin an pêşkêş dikin, pêwîstiya wan bi dû şêwazên nivîsînê heye. Li gorî vê yekê, em malpera xwe https://www.jemal-nebez-stiftung.org wisa dimeşînin: bi Almanî û Îngilîzî û 2 x Kurdî.

**https://www.jemal-nebez-stiftung.org**

Serdana malpera me bikin û ji kerema xwe hinek dem bidin û me nas bikin.




Derbarê me de | Pêzanîn | Pirtûkxane | Merasîm | Zelalî | Bexşandin | Piştgîrîkirin | Projeya demdirêj | Xelata Zanistî | Aramgeh | Goristan | Podcast | Têkilî | Destûra Weqfê | Nû 2022/2021

Ji kerema xwe herweha serdana malpera berê ya hîna heyî ya me jî bikin û nihêrînên li ser karên wî bixwînin. Ev lînk we digihîne wir:

**https://jemalnebez.org/jemalnebez_literatur.html**




Em her wisa weşanên dîjîtal jî pêşniyar dikin.
Di demeke nêz de pêwîstiya me bi malperekê dibe ku îm-kana lêgerînê tê de hebe, ew yek ji bo pêdivî, pirtûkxane û arşîvên me hewce dike. Ji kerema xwe bi bexşîna xwe piştgirîya me bikin. Gelek Spas!

# Hûrguliyên têkiliyê û hûrguliyên bankê

Ger hûn beşdarî serkeftina Weqfa Cemal Nebez bibin, em li hêviya hevkarîya weya jêhatî ne!

Helbet îhtîmala alîkarîya me bi bexşînê jî heye.

Detayên bankê:

Deutsche Bank AG:
IBAN DE69100700240095378600,
BIC (Swift) DEUTDEDBBER

Ji bo bexşîna domdar - hejmara nasnameya deyndêr:

DE74ZZZ00002433240

PayPal

Me li Pay Pal jî hejmara xwe heye.

Di dema hewale kirina pere de despêkê piştrast bin ku peyva „bexşîn“ hatiye nivîsandin û ji kerema xwe nav û navnîşana E-mail a xwe an navnîşana malê binivîsin. Her weha hûn dikarin nav û navnîşana xwe bi rêya forma têkiliyê ji me re bişînin.

Pêwîstiya me bi nav û navnîşana we heye da em bikaribin wesla bexşînê ji we re amade bi-kin. Hemû bexşîn salê du caran li ser binrûpela „Şefafiyet“ ya malpera me bi awayekî nenas têne weşandin. Salê carekê em bi nivîskî raportê derdixin ku me alîkariyên we çawa bikar anîne.

**Cemal Nebez Stiftung**
Spichernstraße 15, 10777 Berlin
Mail to P.O. Box 311044, 10640 Berlin, Germany

Web:
https://www.jemal-nebez-stiftung.org
Email: info@jemal-nebez-stiftung.org

Telefon: +49 (0) 30 86 12 653
Fax: +49 (0) 30 86 15 706